## Sûriye û Rojavayê Kurdistanê piştî şerê Rûsyayê li ser Ukraynayê

»»» R:8



## Pêgeha neteweyên bê maf di Îrana dahatî de kîderê ye?

»»» R:3

## Zêdebûna nifûsê

»»» R:4

## Saziya Mafên Mirovan a Kurdpa, dibe 12 salî

»»» R:7

*Bidestveanîna mafên netewî yên gelê kurd di çarçoveya Îraneke demokratîk û federal de*

# Agirî

Duheftînameyek Siyayasî-Giştî Ye, PDK Îranê diweşîne www.kurdistanmedia.com/kurdî

www.agirimedia.org Hejmar (424) 21-06-2022 Buha (1000) Tumen

# Piştevanîkirin ji mamosteyan erk e

Di çend rojên derbasbûyî de rewşa siyasiya Kurdistanê cuda ji meh û salên derbasbûyî, bi nişkêve û di encama hizra nexweşa rejîma Îslamiya Îranê ji tevgera mamosteyan, hate dîtin ku mencek ji binçavkirina mamosteyên xwedîked û welatparêz li çendîn bajarên Kurdistanê, dest pêkir. Ew yeka jî piştî daxwaziya Şêwreya Hevahengiya Sendîkaya Mamosteyên Îranê hatine kirin ku daxwaz ji mamosteyên seranserê Îranê kiribû ku bo piştevanîkirin li mamosteyên binçavkirî ku tohmeta sîxurbûna wan bo Rojava li ser wan de sepandibû û herwisa cîbicîkirina sozên bi cih nehatî yên rejîmê, li bajaran di ber deriyê Îdareyên Perwerde û Hînkariyê de kombûnan bi rê ve bibin.




Di 11`ê Banemera îsal de mamoste "Îskender Lutfî, Şe`iban Mihemedî û Mesûd Nîkxa" ku endamê Heyeta Birêveberiya Sendîkaya Mamosteyên Kurdistan-Merîwanê ne, ji aliyê hêzên ewlehî ve hatine binçavkirin û piştre tohmeta sîxurîkirina wan bi rêya 2 mamosteyên xelkê Feransê ku niha binçavkirî ne, li ser wan de hatiye sepandin.

Piştre li êwara roja 25ê Cozerdanê, li bajarên Seqiz û Dîwandereyê hêzên ewlehî û bikirêgirtiyên rejîma Îslamiya Îranê, tevî pêwendiya telefonî û gefxwarin li çalakvanên Sendîkaya Mamosteyan, êrîş kirine li ser mala dehan mamosteyên xwendingehan ku di encamê de çendîn kes hatine binçavkirin û bo girtîgehên îdareya Îtila`atê hatine rapêçan.

Herwisa di roja din de mamosteyên berçav li Merîwanê "Aram Qadirî, Tehsîn Mistefayî û Seywan Silêmanî û herwisa endamên Heyeta Birêveberiya Sendîkaya Mamosteyên Kurdistan-Sine û Kelaterzanê "Xeyas Nê`imetî û Selah Hacîmîrzayî hatine binçavkirin. Ew pêvajoya hov heta niha jî berdewam e û bi berdewamî mamoste têne banghêjkirin an têne binçavkirin. Wan navendên rejîmê gef ji mamostayan xwarine ku divê hevkariyê digel wan bikin neku, di paşerojê de qedera xwe û zarokên wan dê xirab bibe. Herwisa gefa derxistina wan li serkar kar û derxistina zarokên wan ji xwendigehan xwarine.

Ew mamosteyane di dema binçavkirinê de rastî azar û îşkencêyê hatine û sivikatî û bêrêzî bi wan re hatiye kirin.

Di nûtirîn nûçeyan de 10 çalakvanên sinfî ku li rojên 25,26 û 27ê Cozerdanê ji aliyê hêzên ewlehî ve hatibûne binçavkirin, dest avêtine girevê û di rewşek nexuya de ne. Her di vê çarçoveyê de Yekîtiya Pîşeyî ya Mamosteyên Kurdistana Îranê, li derheq binçavkirin û gefxwarin ji mamosteyên Kurdistanê daxuyaniyek belav kirin û daxwaz ji xelkên Kurdistanê kirin ku weke hertimî piştevanê mamosteyên Kurd bin. Di vê daxuyaniyê de hatiye ku: "Mixabin mamosteyên Kurdistan û Îranê bi sedema pirisgirêkên mûçeyî û hewcehiyên jiyanê û nedadperweriya pilebendî û ewlehîkirina jîngeha xwendingehan û bi perekirina xwandinê ji aliyê rejîma Îslamiya Îranê ve nekarîne erkê perwerde û hînkariya serdemiyane bo derisxwanan bi baştirîn awayî bi rê ve bibin.

Herwisa rû li xelkê Kurdistanê dibêjin : "Bi hewce ye ku weke hertim xelkê Kurdistanê piştevanê daxwaziyên rewa yên mamosteyan bin bo bi destveanîna mafên wan yên rewa û azadiya mamosteyên binçavkirî li girtîgehên rejîma Îslamiya Îranê de."

Rewşa zal bi ser Kurdistanê de di asta cîhanê de dengvedaye, ku bi awayekê roja Çarşemî 25ê Cozerdanê, Karnasê Mafê Mirovî yê Saziya Neteweyên Yekgirtî "Cawîd Rehman" di daxuyaniyekê de nîgeraniya xwe li derheq tepeserkirina sîstematîk a tevgerên medenî û civakî li Îranê nîşan dabû.

Tirsa rejîmê ji kombûn û girevên mamosteyan bi sedema vê yekê ye ku mamosteyan li ser civakê rol û bandorek erênî û xuya hene, ji aliyek din ve jî mamoste nûneratiya tev mûçevergirên hikûmetê dikin, ji aliyek din ve jî çiqa bihevregirêdana qata kêmdahat û hejarên civakê digel qata xweşbijîva civakê ye, lewma mamoste dikarin xala bihevgirêdere xebatkarên rêya azadiyê bin. Êdî behskirin ji bandora wan li ser tevgerên din yên weke jinan, jîngehparêzan , kedkaran, kêmîneyên olî û herwisa nifşa nû, û nifşa berê jî cihê xwe heye ku siya mamosteyan hertim li ser serê wan bûye, lewma carek din dibêjim ku binçavkirina mamosteyan nîşana rewabûna rêya wan e û erkê exlaqî yê hemû aliyekê ye ku piştevanê mamosteyan bin.

## Sergotar

### *Hevkarî û rêrewî*

**N: Kerîm Perwîzî**

Xebat çi bo guherînkariya di nav sîstemekê de û çi jî bo vêdebirina sîstemek û anîna sîstemeke din hinek taybetmendiyên xwe heye ku, di piroseya cîbicîbûna wan de yan xebat nagihîje bi encamê, yan ji rê derdikeve, yan bi mezaxteke gelek zêdetir û di mewdayeke demê ya gelek zêde de digihîje bi hinek mebestên xwe.

Di welatê bela lêdayî yê Îranê de ku sîstema faşîst û zêdexwaz li ser kursiyê desthilatê, xebat bo guhertina wê sîstemê û hiloşandina wê li gorê de ye û girûpên cuda bo vêdebirina wê dixebitin. Lê, heta niha di hiloşandina rejîmê de serkevtî nebûne û girûpên dijber her li ser dijberiya xwe berdewam in û sîstema dirinde ya zal li desthilatê de tawanên zêdetir diafirîne.

Sedema mana wê sîstemê hem faktorên navxweyî û hem jî faktorên derekî hene û yek ji wan faktorên girîng bo hiloşandin û vêdebirina wê sîstema dirinde, pêk hatina hevpeywendî û hevkariyeke girûpên dijber ku bikarin xwe weke sîstemeke cihgîr pênase bikin.

Ew heyama salên zêde ye ku, di nav Opizisyona rejîma Îranê de behsa wê xalê tê kirin lê, hîn jî ew hebûna hevpeywendî û hevkariya berbilav ku bikare altirnatîva rejîmê pêk nehatiye! Bilî ji tev hûrgiliyên din û behsa wan arîşeyên li ser rê hene dikin, yan vedigere li ser faktoreke sereke bo pêk hatina hevpeymaniyek wiha û hevkaryek bo pirsek sereke li ser navê fêmkirin ji hevkariyê.

Dema ku sîstemek dikare xwe weke altirnatîva sîstemek din nîşan bide ku pêştir gotarekê cihgîr bike û li derheq gotarê bikare xwe bi dîmen û gotareke bihêz û giştgîrtir di gotara dem li ser desrbasbûyî ya rejîmê de nîşan bide. Di dirustbûna gotarek wiha de, deriyê hevkarîkirina bo hêzan jî vedike û ew bixwe dikarin di bin siya hevpeywendiyek ku vê gotarê pênase dike cih bike.

Dirustbûna gotarek wiha giştigîr jî, girêdayî bi dîtingeha dirust bo hevkarîkirinê ku tev rûpel û çiqên di nav cembera giştî ya vê de wekhev û dîtina hemkof û dîtingeheke dîtinî hev ast bibe. Eger kes yan girûpek gelek kêm behsa bihevre bûnê bike, li dîtingehekê de xwe bi tiştên resen û stûnê dabinê û yên din bi çiq û ta ku dikarin li dewra vê kom bibin, di rastiyê de ev bangeşeya bihevre bûnê nake belkû bangeşeyê digel xwe hebûnê dike! Ew bangeşeya nikare gotara altirnatîvê berhev bîne belkû, berdewamkerê hemen gotara bidirêjahiya sedsalên derbabûyî ku bixwe lêzanîneke pîroz didanê û yên din tenê rêrew û derwêşin!

Ji bo vê ku di bin siya çarçoveya dehkên derbasbûyî de derbas bin û girûpên di nav eniya rejîma Îslamî ya Tehranê de, bikare çembera komkirinê dirust bike, divê ji dîtingeha bingehê bo hevkariyê destpê bikin ku gelo em dixwazin hevkar bin û yektir weke hevpêngav bibînin, yan yek bixwe kiroka pîroz ya wê dizane û li ser xêr û dilovaniyê û aliyekê jî yên din dikarin îzinê pê bidin ku rêrewên wê bin! Çi neteweyên di bin zilm û çi her girûpeke din zilmlêkirî yên din nikarin û erê nakin ku rêrewên vê bin, belkû amadeyî hevpêngav û hevkar li bilindahiyek hev ast de ne.

## *Navenda Siyasî ya Partiya Demokrat a Kurdistana Îranê: Reza Pehlewî bê rêziyê bi neteweyên din yên Îranê dike*

Navenda Siyasî a Partiya Demokrat a Kurdistana Îranê: Reza Pehlewî bê rêziyê bi neteweyên din yên Îranê dike

Navenda Siyasî a PDKÎ, di bersiva axavtinên Reza Pehlewî de wekî axavtinek digel hevwelatiyan di daxuyaniyekê de hişdarî da ku gotinên kurê Şahê Îranê tiştek nînin bilî, înkarkirin û bêrêzîkirina bi neteweyên bindest.
Deqa daxuyaniyê bi vî awayî ye:
Daxuyaniya Navenda Siyasî a Partiya Demokrat a Kurdistana Îranê.
Li derheq axavtinên Reza Pehlewî yên bo xelkê serhildêr ên welatê me
Welatiyên rêzdar!
Xelkê şoreşger û serhildêr ên Îranê!
Tev neteweyên bindest yên Îranê!
Di heyama çend rojên derbasbûyî de,Reza Pehlewî di axavtinekê de li ser navê axavitina bi hevwelatiyan re, wekî hevwelatiyekî Îranî nerîna xwe li derheq herekêtên nerazîbûn yên vê dawiyê yên hevwelatiyan li hûndrî welat de anîbû ziman. Reza Pehlewî di wan axavtinên xwe de, li ser yekgirtîbûn û hevkariya xelkê Îranê tekezî dike lê, hevdem bêrêziyê bi neteweyên bindest yên Îranê dike û di heman demê de rastiya çend netewebûna Îranê înkar dike, wan neteweyan weke êl, eşîr û tayfe binav dike û ev yek di halekê de ye ku, her wan neteweyan û bitaybet neteweya Kurd di heyama desthilatdariya Pehlewî û Komara Îslamê de, di rêya gihîştin bi azadî û mafê neteweyatiya xwe de xebat û têkoşîn meşandine û berxwedanî û xebata xwe bi xwîn û canfîdaiya zarokên xwe domandine û dê bidomînin. Reza Pehlewî di wan axavitinên xwe de qet li derheq paşeroja Îranê de gonek nekir ku ,li gorî daxwazên wî be yan belkû daxwazên tev gelên Îranê be.
Eger gotinên Reza Pehlewî yên bêrêz li ser neteweyên bindest ên Îranê, ji bo vê yekê be ku bala hejmarek ji kesên li derdora xwe bikşîne, dikarin çavnhêr bin ku qerebû bike lê, eger weke çawan ku nîşan dide, ji ramanên nedemokratîk û biyanî ji rastiyên Îranê yên paşerojê serçave gritibe. Bê guman ti bandorekê li ser xebata neteweyên Îranê yên li dijî Komara Îslamî a Îranê nake belkû, dê her zihniyeteke erênî li derheq wî de dê bike pirsyar.
Digel dîtingehek wiha de hevdem digel xebat li dijî Komara Îslamî digel wê digel wî jî rûbirû bibe, çimkû dîtingehek bi wî rengî li derheq arîşeyên giştî yên xelkê welatê me de, bilî lawazkirina yekgirtîbûnê ti encamek din nabe.

Di dawiyê de, hevdem digel piştevanîkirin û yekrêziya dubare ya Partiya Demokrat a Kurdistana Îranê digel xelkê têkoşer yên bajarê Ehwazê û xelkê xembar yên bajarê Abadan û bajarên din yên wan hereketan, li ser alîkarîkirin û yekgirtîbûna neteweyên bindest yên Îranê û saziyên din û herwisa hêzên siyasî yên pêşvero û demokratîk yên Îranê, di aliyê hiloşîna rejîma Îslamî a Îranê û lidarxistina nizamek demokratîk û federal ku bersivdarê daxwazan be û daxwazên neteweyî û demokratîk yên tev xelkê Îranê be û herwisa li ser xebata mafdar a xwe tekezî dikin.
Partiya Demokrat a Kurdistana Îranê
Navenda siyasî
21`ê Cozerdana 1401`an
11`ê Hezîrana 2022`an

# Pêgeha neteweyên bê maf di Îrana dahatî de kîderê ye?



N: Nûredîn Sofîzade



Bi berçavgirtina rewşa Îranê bi giştî li warê siyasî, civakî, aborî, ewlehî û navnetewî ve, gelek bi zelalî xuya ye ku emrê rejîma dijî mirov ya Îslamî êdî dawî pêhatiye û roj bi roj zêdetir ev rejîm ji sernixûniyê nêzîk dibe.

Opozisyona wê rejîmê jî û bi taybetî ew alî û hêzên ku xwe seranserî dizanin, wê Seltenet teleban, Komarîxwazan, Komonîstan, Sikolaran, Demokratan, Mocahidîn û yên din, heçî kîjan ji wan bi awayekê xwe altirnatîva piştî herifîna rejîma Melayên deshilatdar dizanin, bi bê vê ku çi bername û pilatformek bo şêwaza sîstema hikûmeta dahatî re hebin.

Ewa ku bal hemî wan hêz û aliyên opozisyona bi nav seranserî girîng û hemî digel hev bawerin, ew xalanene ku herdu rejîmên dîktator yên weke, Paşayetî û Îslamî jî li ser hemen bawer û sîstemê bûn ku ev jî, parastina tevahiya erdê Îranê û înkara hebûna çendîn neteweyên wekî Kurd, Belûç, Ereb, Azerî, Tirkemen û berçav negirtina mafên herî destpêkî yê wan netewane ye.

Wan hêz û aliyên opozisyona seranserî ku hinek ji wan xwe demokrat û sikolar dizanin û basê rêz girtin ji deng û raya xelkê dikin, niha jî amade ninin ku basê hebûna çend netewîbûna Îranê bikin û hin ji wan û bi taybetî kurê Şahê dîktator ku piştî 43 salan niha jî wekî Bavê xwe difikre, ew netewe bi êl û eşîr û tayfe û xêl dibîne û dizane.

Îca virde biryar ewe, erê gelo di demekê de ku opozisyona seranseriye ku renge tenê di nava netewa Fars de ku kêmaniyekî herî kêmê, amade nine îtiraf bi hebûna neteweyên xeyrî fars û mafê wan bike, ew netewên bê maf û part û aliyên siyasiye xebatkarên wan, divê çi bername û pilatformek bo Îrana piştî rejîma Îslamî û bidestve anîna mafê neteweyî ye xwe hene? Bê guman nêzî %70 heşîmeta îro ku di nava cografiya Îranê de dijîn, neteweyên bindest û bê maf yên weke Kurd, Belûç, Ereb, Tirkemen û Azerî ne.

Wan neteweyan derbasbûiyekî pir xebat li pêxema bidest ve anîna mafê xwe hene û heçî kîjan ji wan xwediyê dîrokekî dûr û dirêj a xebatê ne û di vê riyê de jî gelek nirx dane û niha jî xwediyê part û hêzên pêşeng ên siyasî ne.

Lewma hekî wan neteweyan û partiyên wan bername û pilatformekî darêtî û yekgirtî bona bidestve anîna mafê xwe hebin û di nav xwe de yekgirtî bin, bê guman ewa opozisyona seranserî û temamiyet xwaze ku dibe bê û deryê wan bikute û hinekê jî mineta wan bikêşe ku li gel xwe bêxin û piştevaniyê jê bikin.

Lê, hekî perşûbelavî di nav hêzên siyasî yên wan neteweyan de hebe û hemî nekarin bi yêk dengî bernama xwe rabigehînin, tu kes hesabê li ser wan naket û mixabin wekî çendîn carên derbas bûyî di dîrokê de, wê carê jî dê serê wan bê kum bimîne. Şert û mercên sereke jî bona wê yekê dikarin ev çend xalên han bin.

1 – Divê wan neteweyan gelaleyekî darêtî û amade hebin ku, bikarin digel opozisyona seranserî li ser nîqaş û gengeşê bikin.

2 – Divê gelaleya duyem hebe ku hekî li ser gelaleya yekem negihîştine encamekê, bikarin pilatforma duyem danêne ser mîz.

3 – Divê gelek bi rohnî li ser mafê çarenivîsa wan neteweyan gorî şert û mercên weke mafê serxwebûnê, Konfedralîzm, Fedralîzm, Xudmuxtarî û ûtonomiyê biaxivin.

4 – ji bilî opozisyona seranserî, gelek bi cî û hewce ye ew neteweyan basê maf û daxwazên xwe û rewşa pêkhata Îranê, li dîplomasiyeke yek gotarî de ku qisa her hemiyan be, bigehînine guhê welatên biqawete cîhane û bê guma tu opozisyoneke seranserî bi bê piştevaniya yek yan çend welatên mezin, nikare herwisa xwe altirnatîva piştî sernixûniya rejîma Îslamî bizane û bikare bê li ser kar.

5 – Wan neteweyên bê maf û xeyrî Fars aliyê kêm saziyek hene bi navê Kongireya Neteweyên Îrana Fedral, Di rewşa niha ya Îranê de ku hemî rojê xwenîşandan û nerizayetî hene û tepeseriya herî tunde ji aliyê rejîmê ve jî ku li ser neteweyên bindest bi rê ve diçe, aliyê kêm hekî rûyê qisa wan li seranserî Îranê jî nebe, xu dikarin li ser her tiştekî helwêst û peyama xwe hebin û rolê rêberî û hewahengiya di nav wan neteweyan de bilîzin.

6 – Xala herî girîng û balkêş ewaye ku heçî kîjan ji wan neteweyan xwediyê çendîn hêz û sazî û partiyên xebatkarin, raste renge hinek hizb li sîstem û siyaset û taktîka xwe de di gel hev cudahî hebin, niha dema hindê ye ku yekitî û yekgirtinê di nav malên xwe de çêbikin û aliyê kêm stratîjiya wan ya xebatê û xala wan ya hevbeş bila hevxebatî be li ser mesela mafê netewî.

Ez baverim ger ew xalane ji aliyê wan neteweyan û bi taybetî ku çavê wan neteweyan ji dest û peyama part û aliyên siyasiye xebatkare wan netewane ye, bêne berçav girtin, ne tenê di Îrana piştî rejîma wilayeta Feqîh de ew netewane dê bigîjne maf û azadiyên netewî ye xwe îca li her şikl û sîstemekê de be, belkî dê wan netewane rolekî sereke hebin li sergêrî û birêve beriya seranserî Îranê de û êdî niha pêde tu dîktatorek nikare xwe bisepîne û wan netewan nebîne.

# Zêdebûna nifûsê



N:Nîtiştman Urmiye
W: Hesen Mukerem

Zêdbûna rûniştiyên bajar, pîşeyîbûn, kêmbûna çavkaniyan, ji kategoriyên giştî ne bo tûjkirina nifûsê ji gund û bajarên piçûk bo aliyê bajarên mezin ve û di piraniya nuqteyên cîhana sêyem de Metropol weke cihên kêm pêşkevtî tên hesibandin, bêguman zêdebûna asta kategoriyên hatinî behs kirin weke teqîneke nifûsa kêm dahat e, ku derdornişîniya bajarên mezin li pey xwe heye, zêdebûna nifûsa destkurt ku li derdora bajarên mezin, weke sînûrên hatinî sepandin û bizorê, bi awayek berdewam bi îhsaskirina nebûna ewlehiyê derbas dikin ku, hem bo derdornîşanan û hem jî bo bajaran bixwe wêneyek nediyar ji paşerojê temsîl dike.

Berdewam û pêşvebirina şaristaniyê di her civakekê de hewcehî bi mezinbûna zarokên wê ye. Ji bo bidestxistina vê armancê, divê îmkanên malbatî û civakî ji bo peyda kirina tewanînan û vegeşîna tewanînên zarokan were dabînkirin, bi wî awayî Saziya Navneteweyî peymannameyek hiquqê zarokan daye pejirandin da ku, ji vê rêbwarî re rêçareyek yasayî ji bo berxwedanîkirin li hemberî berbestên pêşiya mezinbûna wî/ê de dabîn bibe, pêka vê peymannameyê çavnhêrî tê kirin ku ev koma civakê demên xwe bona xwandin û perwerdekirin yan xweşderbasyê derbas bikin, wiha her cure çalakiyek bilî xwendin û xweşderbasiyê ku demên wan aloz bike, sebebkar tê naskirin, lewma kar kirina zarokan jî yek ji wan astengiyan tê hesabkirin. Îmamê Elî, pêka çalakiyên ku hatine encam dan, mafê zarokan û zêdebûna bingehîn piştevanîkirin ji wan, hîn jî cîhan digel arîşeya karkirina zarokan bitaybet di karên dijwar û zehmet û zirar heyî de rû bi rû ye. Wisa û pêka rapora Saziya Navneteweyî ya Kar(ILO) ya li sala 2016`an de, nêzî 152 milyon zarokên temen 5 heta 17 salî mejûlî kar in, û nîva wan wate 73 milyon zarok di karên dijwar û zirar heyî de mejûl in ya ku girîng e, bi awayek rasterast tendrustî û vegeşîna wan rastî mestirsiyê kiriye.

Ji ber vê yekê jî, welatên ku zêdetirîn nifûsa derdornişînî hildigrin, xwediyê zêdetirîn zarokên kar û zarokên li ser şeqaman in, mirovên ku bi sedemên berfireh di destpêka vê de destkurtî û rewşa kêrnehatî ya aborî de, li pişt kursiyên perwerde û hînkariya paşerojê de, karsaziyên piçûk ji bo alîkariya mezaxta malbatan hatine rakêşan. Ji ber vê yekê diyardeya zarokên kar yek ji girîngtirîn pirsgirêkên cîhana hevdem e, bi qasekî ku ev kirîza bi hemen qasî bajarên paremayî mejûlî xwe kiriye, û bi hemen qasî jî vê rewşê li ser bajarên pêşkevtî bandor kiriye.

Her di wî warî de, ez behsa teoriya bêrêkxistinî ya civakê dikim, pêka vê teoriyê dikarim bêjim ku zarokên kar yan yên li ser şeqaman, elendkirina şert û mecên jîngehî, aborî, civakî û kultûrî a qadên destkurt û mexdur yên derdornişîniyê ne ku, nekariye di herikîna rûbirûbûna digel guherînkariyên civakî yên çend dehkên derbasbûyî li Îranê de digel rewşa heyî rêk bikeve. Civaka ku di heyama dehkên derbasbûyî de guherînkariyên weke, şer, pilanên aborî yên sererastkirina pêkhate, siyasetên aborî û civakî yên nerast, piştî dewra bidawîhatina şer, giraniya vala ya planên vîzyonên 20 salî û yên weke vê cerbandin e.

Her yek ji wan guherînkariyan bi awayek coda li ser jiyana çîn û qadên destkurt yên civakê bi şêwazek coda bandor kiriye ku, encama rengvedan û encamên berevajî hebû ye. Ku encamên giran yên di kevtina wê çîn û qadê di binê wê derdornişîniyê de bûye, ji bo mînak em dikarin bêjin hatina li ser şeqaman a zarokan ji ber pêkve zelqîn û rêkbûna malbatên bêpar û li derdornşîniyê de ji pêvajoya serwet, hêz û meqam di pirensîpa civaka ne wekheviyê de ye.

Pêka statîsîkên heyî di navbera 3 heta 7 milyon zarokên kar li Îranê de hene, mirovên ku weke dabînkerê nanê malbatê tên hesabkirin, lê di rastiyê de eger ev hejamara ji nifûsê ji bo paşeroja nêzîk weke zirarnasî bê hesibandin, zarok tenê vebjirêk nîne ku, ji zirarên hatinî sepandin derbe dîtî ye, belkû şêwaza dabînkerê nan bo malbatê hem ji derbeyên qerebûnekirî ye ku, rendaneve li paşerojê dizivrîn e. Lê, gelo çi navendek tawanbar e bona pêk anîna wê hejmara zêde ya zarokan? Di welatekê de ku çavkaniyên xav yên zêde hene û bê vê ku mifahek kêm here berîka qadên mexdur de. Bê guman navenda dewletî di destpêka vê rêzbendiyê de ji navendên berpsiyar di berhemanîna zarokên li ser şeqaman de ye, ji ber ku karkirina lawaz û kêrnehatî ya vê yekîneyê berpirsyarê wê çerxa girseyî ye. Ji ber ku encama neşiyan û kêrnehatîbûnê hejariya tewav(destkurtiya reha) li pey xwe aniye û di çerxa hejariya tewav de zarok zêdetirîn bandorê dibînin, zarokên kar tenê mejûlî karkirinê nînin û ji xwendin û pewerdehiyê bêpar nemane belkû, gelek caran pêş tê ku li ser şeqaman rastî cureyên reftarên nebaş dibin, dest bo madeyên hişber dibin, rastî mifahwergirtinên girûpên mafyayî yên di nav bajaran de ku mifahên cuda û nerewa ji zarokan re didin kirin dibin û bi awayê giştî ev hejmar ji nifûsê gelek bi hêsanî jinav diçin.

Bi awayê giştî girîngtirîn derbeyên ku di temenê kêm de ji zarokan dikevin wiha ne:

1- Bêparbûn ji mafê xwandin û dûrbûna ji çerxa perwerde û hînkariyê, ev yek ji girîngtirîn wan coreyan e , ji ber ku rasterast li ser kalîteya jiyana civakê jî di paşerojê de bandor dadinê û rola civakê lawaz dibe.

2- Karkirina di temenê kêm de, bi awayek rasterast li ser rih û derûna zarokan bandorê dadinê, û rewşa derûnî zirarê dicerbîn e, ev rewşa nebaş a derûnî dibe sedem ku di temenê mezinahiyê de hem dibe lawazî û hem jî kêmasiyên zêde, aliyê kêm ji aliyê derûnî de hedibe.

3-Destbirin bo madeyên hişber û zirarên cuda yên civakî.

4-Bûn bi mafyayî jîrî û şiyanên ku îmkan heye zarokekê divê hebe lê, ji ber kar û hejariya civak dê di paşerojê de jî bêpar bimîn e.

5-Tevlîbûn bi komên mafayî ku dubare bi awayê rasterast dibe armanc.

Lê mixabin, malbat di dijwartirîn şert û mercan de hem dikarin ji bo zarokan aliyê kêm di temenê kêm de, weke piştevan bixebite û zarok di tengasiyên metirsîdar yên kar de bi tenê nehêlên, hêsantirîn rêya pêş berî malbatan ev e ku, dikarin pêşî ji jidayêkbûna zêde ya zarokan bigirin, herçend ku ev rêçara zanistî û bicih ji bo pêşîgritin ji hejarî û vegera zarokan bo kar nîne lê, heta qasekî ev kêmî hejamra mirovên li hundrî malbatê de bi kêmkirina mezaxtên rojane rû bi rû dike û di encamê de ev givaşa malbatan heta qasekî li ser milê zarokan radike.

# Krîza hiloşandina rejîma Îslamî ya Îranê

N: Namo
W: Agirî Enzel



Em dikarin Komara Îslamî ya Îranê weke rejîmek durû bi nav bikin. Pêkhatiyek ji sembolên xuya yên demokratîk û navendên otorîtexwaz û serdestî ji yasayê ye.

Yaku rejîma Îranê demokrasî piştguh xistiye, û ji sembolên demokrasiyê bona temsîlkirina xwe di civaka navneteweyî mifahê werdigire, ji ti kesî re veşartî nine. Bi awayek xuya dimokrasî di wirda, hin cemberên daxistî yên bijardeyên dewletî bona guhertina desthilatê digel yektir rikeberiyê dikin, û hilbijartin û navendên demokratîk weke anûrekê ji bo bidestxistina rewatiyê mifahê werdigrin. Herçend ku pêşbirkêya bijardeyan micide jî, lê em nikarin rewt û piroseya hilbijartinan bi ti awayekî bi îdalet û azad bihesibînin. "Beyta rêberiyê" li ser kupika desthilatê hatiye avakirin e.

Rêberî, çavkaniya herî bilind ya danîna yasayê û çavdêrî cîbibîkarê wê ye, û li gor berjewendiyan dikare wan binpê bike. Tedbîrên taybet û lezgîn û biryarên hikûmetî dikarin her pêgehekê bo rewşên gelek kêm veguherîne û yasayê jî ragire. Rejîmên durû yên îdeolojîk xwedî nermbûnek dahêner in û di demekê de ku pere bi reşbîniyê bi rojavayê ve girê didin, di hemen demê de ew bi xwe bi rojavabûnê pêş ji yên din dikevin.

Li gorî rapora saziya lêkolînê ya "Sandiqa Aştiyê", rewşa Komara Îslamî ya Îranê li rêzbenda rejîmên îflaskirî û li pêvera welatên hejik û berxweneder di navbera rengê pirteqalî û sor de cih girtiye û di texmînkirina pêgeha îsal , ew kirîz kûrtir dibe.
Ev lêkolîna di çar beşên weke: "Yekitî û aramiya giştî, xerîteyên aborî, xerîteyên siyasî û xerîteyên civakî de hatiye encam dan".
Îslama siyasî-şî´e, di destpêka şoreşa sala 1357´an a rojî de, îdeolojiyek heta astekê berfireh bû ku, karî di dehka yekem de li besîckirina beşek zêde ji civakê bona rewatî dan û pêkanîna çarçoveya şiklê gotareke serdest bona hincent gritinê bo berdewamiya hikûmeta Komara Îslamî, rolê bilîze. Lê birêveberiya çil saliya rejîma Îranê weke rejîmeke dîktator, tenê ji ber parastina desthilatê û mana sîstemê tund bûye, ew jî bi mifah wergrtin ji serkutkirina civakê û zêdekirina tirs û tunditîjiyê ye.

Piştî serhildana xwendekaran di Pûşpera sala 1378´an de bû ku, rûyê rast yê Komara Îslamî ya Îranê bo navendnişînan jî eşkere bû. Helbet Kurdan bi beşdarînekirin di referandoma destpêka şoreşa sala 1357´an, xwe digel sestema Îranê yekalî kiribûn; Kurdan bi "na" gotina xwe, rastî kerb û nefret û dijminatiya mafyayên desthilatê hatin. şîpela duyem a nerizayetiyan di duyê Banemera sala 1388`an de bû. Şîpela sêyem ya nerizayetiyên seranserî li meha Befranbara sala 1396`an, Gelawêja sala 1397 û Xezelwera xwînavî a sala 1398`an nîşan da ku, Komara Îslamî tûşî kirîza rewayîbûnê bûye û gihîştiye asteke kûrtir ji kirîzê û ango krîza hilweşînê.
Rewatiya reha jiyana rejîmên dîktatoran ku ji rêya wê ve desthilat bidest dgrin û hikûmetê dikin.

Pênaseya peywendiya "gel û hikûmetê" ew e ku, xelk li rewta rêkevtinek civakî de, bi amenet "desthilatê" radestî "desthilatdaran" bikin.

Her di vê derheqê de, gel "mafdar"in û desthilatdaran "erkdar"bikin ji bo dabînkirina rizamendî û qezencên giştî; Eva mijareke ku desthilatdarên Îranê pênaseyeke berevaj jê hene.
Rejîma Îranê "gel weke xelkek emegdar û sîstemê jîbi bexşîna "Îlahî" bo gel" pênase dikin û xwe bi nûnerên hikûmeta "Xweda" didin nasîn û ji wê rê ve Welî Feqîh ku rêberê rejîmê ye, weke pîroziyekê nîşan didin. Ev yek di demekê de ye ku, nerazîbûnên seranserî, yên sinfî û qatên cuda yên civakê, nîşana şikandina tabû û sembolên pîroz ên rejîmê ye.
Bi awayê ku di hikûmetên dîktator û totalîter de hatiye dîtin, dema ku piroseya "helweşînê" lezgîntir dibe, sîstemên dîktator- bitaybet curên îdeolojîkî-xebatê dikin, piçûkkirina navenda desthilatê, ewlehîtir û tundtir û serkuttir reftar bikin. Lê, ev du mikanîzm, wate piçûkkirina navenda desthilatê û di hemen demedê de pişt qahîmkirin bi serkut û tundtîjiyê, di demekê de li dijî hev kar dikin û serkutker neçar dibin an çeka xwe bizavirînin bo rûyê navenda desthilatê, an jî bizavirînin bo singê xelkê. Ji wî haletî re, "dorpêçên medenî yên hikûmetê" dibêjin.

Hilweşandina hikûmetê bi giştî bi wî wayî ye, li guheritina hêdî, îhsas pê nekirî û di navbera nifşê de. Di vê rewşê de tenê mêrxasan şiyana anîna ziman a rastiyan hene û piranî hevrengê dibin.
Li pialîbûna derve, pêş ji hilweşandinê bi giştî şer diqewime û ji nav xwe de nerizayetiyên berferh û serkut tên gorê.

"Pêl Kendî" dîroknasê Birîtaniyayî, li ser wê baweriyê ye ku, welatên di halê hilweşînê de ne, ji bo ewlekariyê pereyek zêde mezaxte dikin û di encam de rewşa xwe pitir tevlîhev dikin. Li derheq şoreşan , di demekê de kirîz diqewimin ku rejîma şiyana besîckirina hêzên xwe ji dest bide û ev yek dikare, wateya bidawîbûna hikûmeteke sedsalên Navîn bibe.

# “Mariya Pîşnemaz”: “Bi xatircemî ve ez dibêjim ku ez bi agaheyek tevayî û hişyariyê ve tevlî Partiya Demokrat bûm”



Min hevpeyvînek li derheq çawaniya nasîna Partiya Demokrat a Kurdistanê digel xatû Mariya Pîşnemaz pêşmerga Hêza Pêşmergê Kurdistana Îranê pêk anî û wê di vê derheqê de wiha got: Malbata min bi awayek berdewam behsa Komara Kurdistanê û şehîdê hertim zindî Pêşewa Qazîmihemed û gelek lehengên din yên gelê me dikirin.

Hevpeyvîn: Hesen Mukerem

**P**: Rêzdar ji kerema xwe ji xwendevanê me re bidin nasîn û xelkê kîj herêmî ne?

**B**: Tevî silavên gerim bo tev xebetakar û emegnasên gelê Kurd, navê min Mariya Pîşnemaz e û li malabateke nîştimanperwer û hizb dost li sala 1378`an li bajarê Mehabad jidayîkbûm e, û her di vê wî bajarî de vegeşiyame û heta asta navendî jî xwendewariya min heye, bi kêfxweşî ve weke keçike pêşmerge tevlî refên Hêza Pêşmergê Kurdistanê bûme û bo berevanîkirin ji mafê gelê Kurd têdikoşim.

**P**: Rêzdar we çawa Partiya Demokrat a Kurdistana Îranê nas kir?

**B**: Ya ku min çawa Partiya Demokrat a Kurdistana Îranê nas kiriye vedigere bo salên derbasbûyî, ji ber vê ku di malbateke wisa de mezin bûme ku, bi awayek giştî eleqedarê xebat û şoreşê ne û hûn bixwe jî bi baş dizanin ku mela Resûl Pîşnemaz û mela Hesen Restigar ku çi qas bandor û rolek girîng di xebat û şoreşa gelê Kurd de hebûne, her ev yek jî bû sebeb ku ez PDKÎ nas bikim. Eger ez bizvirim bo serdemên zarokatiya xwe ji bîra min ne ku piraniya deman li malê rûdinştim û ev şîret yan ev berçavroniyên ku ji min re digotin yan ez xwe bêjim bi awayek berdewam behsa Komara Kurdistanê û şehîdê hertim zindî Pêşewa Qazîmihemed û gelek lehengên gelê me bigiştî dikirin, her ev peyvên ciwan yên wan xebatkaran bû bi dersek girîng û taybet ya ku bêjim dem bi dem serdemên zarokatiya min bi xwendina sirûda neteweyî ya Ey Reqîb dest pê kiriye, û her ev jî bûn bi piştevan û ez tûjkirim ku berdewamkerê rêya bav û kalên xwe bim û bona rizgariya gelê Kurd di bindestiyê de rêya wan wunda nekim, wate her di serdemên zarokatiyê de Partiya Demokrat bo min naskirî bûye, weke Partiyeke neteweyî ku partiyek piştevanê komên xelkê Kurdistanê şibandiye.

**P**: Gelo hûn ji ber bêhêvîbûnê hatin bo nav Hizbê yan bi hebûna agehdariyan?

**B**: Bi xatircemî ve ez dibêjim ku ez bi agaheyek tevayî û hişyariyê ve tevlî Partiya Demokrat bûm û bi xwandinek kûr û hûr bi naskirina dîroka vê partiyê yan her ya ku min li jorê behs kir, bi ezmûnên bav û kalên xwe ez hatim nav vê partiyê û weke keçek pêşmerge xebat û şoreşê dikim. Dema ku ez dîroka neteweyên din dixwînim ku bi çi awayekî gehiştine armanca xwe û niha di azadî, aramî û ewlehiyê de dijîn, gihîştim vê baweriyê ku azadî bê qurbanî dan, zehmetî û têkoşanê bidest nehatiye û nayê , lewma em weke neteweya Kurd di qunaxa xebat û têkoşanê de ne, erkê hemû civakê ye çi jin, çi mêr, çi ciwan û … hwd, beşdarî xebatê bin, lewma ez jî weke takek hişiyar li derheq zilm û zor û neheqiyên ku li derheq gelê me tê kirin, min xwe bi berpirsiyar zanî û hatim bo nav partiyek ku bersivderê daxwaziyên civaka Kurdistanê ye, bi vê wateyê ku min xwe li nav Partiya Demokrat a Kurdistana Îranê de dît ku hemen rê û rêbaza bav û kalên min e.

**P**: Ji dîtingeha we niha di nav civakê de her takek heta çi qasekî dikare xizmeta armancên pêşmerge bike?

**B**: Di rastiyê de behs kirin ji armanca pêşmergayetiyê gelek hizr û ramanên cuda û taybet û binirix li xwe digire. Yek ji wan eve ku di warê madî û me`newî de tu dikarî xizmetê bi wan armancên pîroz bikî, lê ya ku gelek girîng e, warê hizr û ramanan e, li warê çalakbûnê ye, li warê vê yekê ku pêka daxwaziyên pêşmergan pêngavan bavêjî, cih û pêgehek taybet bi xwe heye û cihê balkişandinê ye. Ger behsa takên civakê û hêza pêşmerge bikin, du tiştên bihevre girêdayî ne û herdu hewcehî bi yektir hene, ger beraxwe bidinê bi dehka 60î, wê demî ku PDKÎ yan bêjîn hêza pêşmerge di nav dilê Rojhilatê Kurdistanê de bû, gelek caran pêşmergên berê bo min behs kirine ku wê demî xelk li gund û bajaran piştevanê pêşmergan bûn, ji warê xwarin û kinc ve bigire heta … hwd, lewma di serdema niha de jî, ku li sala 1395`an ve Rasana Rojhilatê ji aliyê PDKÎ ve hate ragihandin, ew bi wê wateyê bû ku xebata Çiya û Bajar bihevre girêdan û pêşmergên çiya û bajar yan civak û hêza pêşmerge bihevre giraniya xebatê bixîne li ser milê xwe û piştevanê hevbin. Ger berê xelkê hevkariya pêşmergan dikir, lê niha gelek zêdetir û baştir li hemû îdare, bazar, zanîngeh û …hwd, her kes pêka şiyana xwe erkê pêşmergayetiyê û erkê nîştimanperweriyê gritiye stûyê xwe û bi rê ve dibe. Bi vê wateyê ku takên civakê ne tenê xizimetê belkû heta astekî dikarin çarenivîsazê armancên pêşmergan bin, êdî ew kes çi li warê jîngehparêzî ve kar bike, çi xwandekarek be li nav zanîngehan de yan nivîser yan helbestvanek û dehan kesên din bin, di nav civakê de li pêka karê xwe xizmetek mezin bi armancên Hêza Pêşmergê Kurdistanê bikin.

**P**: Rejîmê ku heta behsa dorgeya aram dikirgelo Rasanê li ser vê yekê bandor hebûye ku rejîm behsa wê dikir?

**B**: Belê bi xatircemî ve Rasanê bandorek zêde hebû ye, û deriyê bêdengiyê şikand û rejîmê jî baş îhsas bi vê yekê kir û weke kartek givaşê li ser xwe dibîne. Ger em beraxwe bidin bi qunaxa xebata pêş Rasanê, ew karta givaşê li ser rejîma Îranê kêmreng bibû, lê bi ragihandina Rasana Rojhilatê rewş hate guharîn û ber bi aliyekê din ve herikî, tevî vê ku civaka Rojhilatê henaseyek nû mişt, ji aliyek din ve rejîm zêde tirisiya û koşka zilm û zor û dûrengeya aramiya vê herifî û têkçû, heta li gelek cihên taybet û girîng de rejîmê behsa piroseya Rasanê dike, û behsa bandor û gefên vê piroseyê li ser rejîmê bixwe dike, meseleyek din ku gelek girînge, ya ku Rasan tenê bi xebata çekdarî ve nehatiye girêdan, belkû pirr aliye û civak dikare li hemû şêwazên din yên xebat û têkoşanê bo parastina nîştimana xwe beşdar bin û ev yeka bûye sedema tirs û nîgeranî û nearamiya rejîmê.


Spas bo vê derfeta ku we da bi min

## Nerîna Lîderan



Boris Johnson:

Divê Eurovision a 2023`an li Ukrayînê were lidaristin ne li Birîtaniyayê.



“Lavrov”:

: Rûsya ne paqije û em jî jê fedî nakin



“Pompeo”:

Rêveberiya Biden bi nêzîkbûn bi Îranê re, ewlehiya Rojhilata Navîn û Amerîkayê dixe metirsiyê



“Dr. Ehmed Vehîdî”:

Sererastkirina bernameyên aborî tenê rêya rizgarkirina aboriya welat e.

# Saziya Mafên Mirovan a Kurdpa, dibe 12 salî



N: Eskender Ceiferî




Saziya mafên mirovan a Kurdpa, ku berê tenê malpereke nûçeyan bû, dibe 12 salî.

Wek baktiriyan, saziyan ku xwe wek parêzvanên mafên mirovan binav dikin, berfireh bûne. Di vê navberê de piraniya wan, tenê ji bo pere hatibûn avakirin, ji xwe piştevaniya aliyên navdewletî ji bo çalakvanên mafên mirovan jî bûye sedem ku fikra bazirganiyê berfireh bibe. Bi awayekî ku kesek dirabe û malperekê ava dike, navê wê didanî sazî û ji no karên xwe, piştevaniya malî jî bi dest dixîne. Lê belê pêwîst bû saziyên wek Kurdpa, ajar vedin û bibin dengê binpêkariyên mafên mirovan li Kurdistana Rojhilat.

Saziya Kurdpa ku ev 12 sal in çalak e û du salan berî niha li Dewletên Yekbûyî yên Amerîkayê hate tomarkirin, di daxuyaniya xwe ya avakirinê de ragihandiye: “Rewşa nebaş a mafên mirovan li navçeyên cuda yên Îranê û kiryarên desthilatdariyê ji bo binpêkariya zêdetir, berfireh û berdewam a mafên mirovan, bûye sedemeke girîng ji bo avakirina saziyeke mafên mirovan a serbixwe. Ew sazî wê hem nûçe û zanyariyên derbarê wan binpêkariyan tomar bike û hem jî binpêkariyan bişopîne. Saziyeke bi vî rengî, dikare li wan navçeyan ku saziyên din li wêderê çalak nîn in, perwerdeya mafên mirovan danî. Li ser vê bingehê jî Kurdpa wek saziyek ku ne li ser pêgeha berjewendiyê hatiye avakirin, pişta xwe bi hin rojnamevan û nûçegihanên pêşketî germ dike ku ji berê ve li hin ji wan navçeyan kar dikin lê belê ew kes hatibûn piştguxistin. Saziya Kurdpa ji aliyê toreke çalakvanan ve ku ji heman navçeyan in, hatiye avakirin.”

Kurdpa ku ji aliyê şehîd Kawe Cewanmerd ve hatibû avakirin û heya niha jî di çeper û rêbaza wî de ye, ni awayekî xwebexşane ji aliyê kesên dilsoz ve ji bo doza Kurd û mafên mirovan li Kurdistana Rojhilat bi awayekî bê beramber tê rêvebirin. Vê saziyê di beşeke din ji daxuyaniya xwe de tekez kiriye ku Kurdpa dixwaze kêmasiyan di warê nasandin û ragihandina binpêkariyên mafên mirovan de qerebû bike û vê valahiyê tijî bike. Li ser vê rêbazê jî 3 xalên sereke hene ku Kurdpa xwe bi wan wefadar dibîne;

Xala yekemîn ev e ku saziyên mafên mirovan dikevin bin bandora siyasetê. Saziya Kurdpa, wek bingeha xwe ya sereke, hewl dide ji bo eşkerekirin û ragihandina binpêkariyên mafên mirovan, ji siyasetê dûr be. Di vî warî de Kurdpa dixwaze serxwebûn û pêşketîbûna xwe biparêze û dûrî ramanên siyasî be.

Ev sazî, ramana xwe û enerjiya xwe, ji bo parastina mafên mirovan bi kar tîne ku di vê rêbazê de dehan qurbanî jî dane. Ne tenê rêveber û avakerê wê hate şehîdkirin, lê belê bi dehan rojnamevanên Kurdpayê jî çendîn caran ji aliyê dagirkar ve rastî givaşan hatin. Lê ji bo Kurdpayê, parêzvanîkirin ji mafên mirovan ji her tiştî girîngtir e. Lewma jî qet bixwe piropagende bi wan nekiriye. Kurdpa di beşa duyemîn û girîng a daxuyaniya xwe de ragihand ku: “Ramana Kurdpa, berpirs û hevkarên vê, tenê mijara parastina mafên mirovan e. Lewma jî rênimûniyên navnetewî yên mafên mirovan, ji xwe re wek bingeh dibînin. Saziya Kurd dixwaze endamên xwe û kesên ku hez dikin, li ser hizra parastina mafên mirovan perwerde bike da ku valahiyên di vê derbarê de tijî bike. Sedem jî ev e ku hizrên siyasî û nebûna baweriyê bi parastina mafên mirovan wek bingeh, di nav nûçegihanên mafên mirovan de jî têne dîtin. Carna jî fikrên wan ên siyasî, netewî, olî û zayendî dibin sedema kêmbûna çalakiyên wan û herwisa dijatiya mafên mirovan.”

Ji xeynî van du xalan, saziya Kurdpa amaje dide xaleke din a herî girîng ku derbarê piştrastkirina zanyariyan e. Eger saziyek, hemû gotegotan wek nûçe belav bike, ne ew sazî dikare bibe cihê baweriyê û ne jî karê rêveberên wê, wek dilsozî tê binavkirinn. Kurdpa di beşa dawiyê ya daxuyaniya xwe de dibêje: “Xala sêyemîn jî ev e ku saziya Kurdpa, zanyariyên xwe ji xeynî çavkaniya sereke, ji çavkaniyeke duyem jî piştrast dike. Em zêdetir di vê derbarê de girîngiyê didin nûçegihan, parêzer û wan çalakvanan ku ji berê ve di vê mijarê de çalak in. Ev pirose, ji bo me baweriyê li pey xwe ve tîne.”

Saziya Mafên Mirovan a Kurdpa, sala 2020’an li ser van 3 bingehan, li Dewletên Yekbûyî yên Amerîkayê hatiye tomarkirin û çalakiyên xwe berdewam dike.

# Sûriye û Rojavayê Kurdistanê piştî şerê Rûsyayê li ser Ukraynayê



N: Ebdûlazîz Qasim



Her ji 24.02. 2022'an ve û destpêkirina şerê Rûsyayê li ser Ukraynayê û heta îro jî ku ti bijardeyek dîplomatî û siyasî ji bo rawestandina şer û dîtina çareseriyeke aştiyane peyda nebûye, ku her aliyek wanê daxwaziyên xwe bilindtir dikin, Rûsiya ji biryara destdanîna li ser herêma Donbas venagere, û herwisa ku qebûl nake heta gotûbêj li ser herêma "Kirimla" bibe, di heman demê de tevlîbûna Ukraynayê di nav Yekîtiya Ewropa û NATOyê de red dike.

Li hember êrîşa Rûsiya, ku Amerîka û dewletên Ewropî roj bi roj dorpêçên aborî û sizayên darayî li ser Rûsyayê zêde dikin, û cîhan bi tevahî ber bi qeyranek aborî ya mezin diçe, ku bi qeyrana genim û gazê tê binavkirin.

Lê, li Sûriyayê qeyran ji qeyrana genim û gazê mezintir e, bi taybetî ku rola Rûsyayê di Sûriyê de kêm bûye bi sedema şerê li Ukrayna, ku heryek ji Îran û Tirkiyê kar dikin ji bo şûna Rûsya û Amerîka bigirin û pêgeha xwe ya leşkerî û siyasî di qada Sûriyê de li ser hesabê kêmbûna pêgeha Rûsiyayê zêde bikin, ku niha bi awayekî berçav pêgeha Îranê netenê di Sûriyê de, herwisa di Îraqê de jî zêdetir bûye, û Tirkiyê jî bi mifadîtin ji şerê Ukrayna û peydabûna qeyrana gaz û xwarinê, hewl dide deverên din yên Rojavayê Kurdistanê dagîr bike, bi taybetî herdu navçeyên Tilrifet û Minbicê û herwisa temamkirina pirojeya guhertina demografîk li herêmên kurdan yên dagîrkirî.

Li gorî kovara Amerîkî "The National Interest" ku Serokomarê Tirkiyê Recep Tayyîp Erdogan "krîzan bo xwe diguherîne derfet" û krîza Ukraynayê mînakek li ser vê yekê ye, ku piştî êrîşa Rûsyayê li ser Ukraynayê, ku rola Tirkiyê zêdetir bûye bi sedema cihê wê cografî li ser derya Reş de û hewldanên Erdogan yên ji bo hevdîtinên di navbera Moskova û Kîevê de, lê tevî wisa jî ku Amerîka rehniya kesek neda Tirkiyê ji bo dagîrkirina Tilrifet û Minbicê, herwisa ku Rûsiyayê ti rehniya kesek nexistiye di destê Tirkiyê de.

Berevajî seredariya nerim ya Rûs û Amerîkiyan ligel destdirêjiyên Tirkiyê û piroje û planên wê yên ji bo jinavbirina pirsa kurdî û miletê kurd, ku Îsraîl bi tundî bersiva zêdebûna hejmongeriya Îranê dide, bi taybetî êrîşa Îsraîl ya vê dawiyê di 10'ê vê mehê de li ser balefirgeha Şamê, ku li gorî rewengeha çavdêriya mafên mirovan SOHR ku her ji destpêka îsal ve ji aliyê Îsraîl zêdetir ji 15 êrîş li ser baregehên Hizibulah û pasdaran ve di nav qada Sûriyê de hatine pêkanîn, bi vê yekê xuya dibe ku Îsraîl dê kar li ser kêmkirina pêgeha Îranê bike.

Bi dîtina min, piştî serdana Joe Biden ya ji bo Erebistana Siûdî di 15-16 Tîrmehê de, û beşdarbûna wî di lûtkeya hevbeş de digel Şah Selman û serokên welatên Encûmena Hevkariya Kendavê, Şahê Urdinê Ebdullahê Duyem, Serokomarê Misrê Ebdulfetah El-Sîsî û Serokwezîrê Iraqê Mistefa Kazimî, ku dîmenên siyasî yên nû peyda bibin û herwisa ku terazû û hevsengiyên siyasî yên berê bêne guhertin, bi taybetî ji bo zêdekirina hinartina gaz û nefta kendav û Erebistanê ji Ewropa û Amerîkayê re, helbet ku mercên Ereban hene, bi taybetî ku piraniya mercên wan dikevin di çarçoveya kêmkirina rola Îranê de, herwisa ku projeyê hevbeş yê Îsraîl û Misrê digel Kuprus ji bo gihandina gaza şil "liquefied gas" di nav ava derya Spî de heta Yonanistan û Îtaliya, dê rola Tirkiyê jî di salên bê de lawaz bike, nemaze ku gelek problem yên wan hersê dewletan Misr, Kuprus û Yonanîstan ligel Tirkiyê hene, li dawiyê ku bi kêmkirina rola Tirkiyê û Îranê dê derfetên baş ji bo çareserkirina pirsa kurdî peyda bibin.



# Li derheq fîmînîzim û dûrxistina olê ji dewletê



N: Vênûs Fayîq
W:Hesen Mukerem

Lobbies Tobani xelkê welatê Kenadayê ye, fîmînîzimê wiha pênase dike: “Di destpêkê de derxistina hişyariya tak û piştire jî ya bikom, piştire bo vegeşînkirina şoreşê li dijî hêza zayendan û marjînalîzekirina tewav ya jinan di demên dîrokî yên taybet de”. Xuya ye ku di vê pênaseyê de û di gelek pênaseyên din de fîmînîzim tenê ji jinan re nehatiye girêdan, herçend ku di destpêkê de ji aliyê jinan ve hatiye aifrandin, lê di rojgara îroyî de pir guherînkarî li ser vê desteyê de hatiye, niha mêr jî hene ku xwe weke fîmînîzimê didin zanîn, pêka vê ku maf û azadiya jinan nas kirine û herwisa di vê derheqê de çalakin û xwedî helwest in. Dikarim bêjim ku fîmînîzim koma têkoşîn û çalakiyên takan li civakê de bo maf û azadiyên jinan li ser bingeha wekheviya bi mêran re ye.

Pir zehmete bikarin destpêka têkoşîna jinan li dijî çewsandin, zilm û zodariya mêran dest nîşan bikin, têkoşîna jinan li pêxema maf û azadî û wekheviya digel mêran de parek ji hev qutnebûna ji têkoşîna tewav ya mirovahiyê di dîrokê de li dijî tev zilm û zodariyan ne. Welatên Rojavayî berî me îhsas bi metirsiya destêverdana Ayîn û Dêran di jiyana takên civakê de kir, her ji ber vê yekê ye ku her li destpêka sedsalên  sêzidan de, jinan li dijî civaka mêrsalarî û li dijî desthilata Dêran têkoşîn destpê kirin.

Di civakên weke civaka me de, jin bi giştî û çalakvanên warê maf û azadiyên jinan, çi di asta tak de û çi jî di asta çarçoveya saziyekê de, li hember arîşeyên mezin de ku tevlîbûna Ayîn di desthilata siyasî û îdarî de û ji aliyekî din ve jî, tevlîbûna Ayîn di nav jiyana civakê de dirust kiriye.

Helbet yaku edet û rohne pergala îlmanî ye di nav civakên li ser norm û nirxên Ayînan de hatine daxistin ku dibe îşareyek zeq, kifir û xwedênenas, di demekê de di wan civakan de eger corek propagendekirin jî bo îlmaniyetê hebe, ew propagendane li derveyî pergala îdarî û li derveyî civakê de ne, wate xwe di nav nîqaş û helwestên teorîk de dibîne, hundrî qonaxa piraktîkê nabe û nabe bi morkek xuya ya civakê li warên siyaset û jiyana takan di civakê de. Çimkû ya peyrewî jê tê kirin ev yasayn ku bi pişt girêdan bi destûrek darêtî ye ku Ayîn kiriye bingehek sereke bo danîna yasayê û her bi vê awayî jiyana civakê jî rêkxistiye. Ev yeka jî rikeberiya di navbera îlmaniyan û hilgritina hizra Ayînê zêdetir zeq kiriye, Bitaybet çalakvanên warê fîmînîstê.

Di cîhana Rojavayî de, li serdemên daxistî de ew li ser vê baweriyê bûn ku pirtûka pîroz bingeha peywendiyên di navbera Dêr û paşayan û “desthilata siyasî” ye, her ji vê aliyê ve jî tev nirxên exlaqî û mirovahiyê dibînî û her li ser vê bingehê jî peywendiya takan û desthilatê saziyê hatibû rêkxistin, ku ev jî bi baweriya wan xwasta xwedavendan bû. Lê, ya ku piştire ew yek guhert, çawaniya xwedin û şirowekirina wê pirtûkê bû di du qonaxên dîrokî yên coda de. Ew gihîştin bi vê baweriyê ku deqek pîroz digel her deqek din de ti codahiyek nine û nabe tenê li ser yek qonaxê de bê daxistin, belkû îmkana vê heye ku çendîn şiroveyên cuda bo bê encam dan û pêka qonax û pêka vê serdemî ku tê de dijîn, ev hizr û eqîdeyên wan serdeman digel xwe tînin..




Her ev yek jî ku niha digel de be, Ayîna îslamê erê nake û birastî razî jî nine dest bo dirêj bike. Çimkû li dîtingeha wan deqên Qoraanê carek din hêjayî nîqaş kirin û şirovekirine nîn in, her eva jî hilgirên hizra îlmanî bi ti awayî wan razî nake, ji berku baweriya wan wisa ye ku tevahiya cîhanê li ser bîrdoziya guhertineke berdewam de ye û ev hizra ku bo serdemên tarî hêja bûye, hêjayî wê serdemî nine ku, cîhan bûye gundeke piçûk û li ser înternetê û bi sedema warên teknelojiyayê bi hêsanî destê te digihîje tev zanyariyan û li berahîka te, ti tiştek veşartî nine û ti tiştek nine ku hêjayî guhertinê nebe.

Bi baweriya min her di niha de, baştirîn karê ku jin dikare encam bide eve ku bi dengek bilind daxwaza codakirina Ayîn û siyasetê bike û bi tekezî daxwaza dûrxistina Ayîn li dewletê bike, dema ku ev yek rû da dê xwe bi awayek xweber û hêdî hêdî aliyek nû bo takên civakê hilbikeve bo hizrkirinek din û dîtingeheke din bo mijara jinê, çimkû wê demê rewşek îlmanî siya xwe li ser tev warên civakê de, û di nav yasayan de dide xuya kirin, wirda jî warên perwerdehî û xwendinê  bo xwe bi awayek xweber tevlî pergala îlmanî ya wê dibin û ne wekî pê digîhîjin ku bawerî bi xwenasînek tewav bi maf û azadiyên jinê hedibe û bi her core hizr û nerînek din henek têkirin ku li dijî wê diaxive.. Yaku niha fîmînîst rûbirûyê vê dibin Ayîn, norm û nirxa Ayîna ne, bilî vê ku desthilata vê qîmet daye bi partiyên Ayînî, digel wana de jî ev yasayên ku Ayîn bi bingeha yekem ya yasa danînê dizanin.. Dema ku wisa ye tevgera fîmînîzimê encama perwerdehiya li dijî dewletê ye, partiyên Ayînî, kultûreke paremayî ya Ayînê ne, yasa, û … hwd .. Yaku wana careser dike nîqaşkirina Ayînê ye li hûndirê mizgevtan de û ti peywendiyek bi dewletê ve nebe, û bibe erk û taybetmendiyeke tak. Wê demê pergala îlmaniyetê zêdetir kirametê bo tev hizr û ramanên Ayînî yên din û heta bêbaweran jî ji xwe digre, herwisa barimteya zêdetirîn maf û azadî bo jinan e û panahiyek berfrehtir bo guherînkarî û hizr û ramanên coda pêk tê.

Di dawiyê de bi baweriya min jin nabe bi tenê di eniyekê de şer bike, nabe têkoşîna jinan bo bidest xistina mafên xwe ji têkoşîna tevahiya civakê ya li dijî hemû zext û zordariyan bê qutkirin, ji aliyekî din ve divê jin, mêrê tevlî xebata xwe bike û xebata xwe di daxwazkirina mafên azadiyan bo jinên hatinî çewsandin berfirehtir bike, yan bilind bike, bo xebat li dijî desthilata Ayîn û tevlîbûna Ayînê digel dewletê. Bi çend peyvên din tevgera fîmînîstê bi cihê vê ku dijî mêr şer bike û mafên xwe ji mêr bistîne, divê mêr neçar bike digel de şer bike.

# SIYABEND Û XECÊ



**N: Lokman Polat**


Di nav nivîskarên kurd de yek ji ê herî berhemdar Zeynelabidîn Zinar e. Ew kedkarê berhevkirin û amadekirina stran û çîrokên folklorîk yên di nav gel de ye. Wî bi sedan çîrokên gelêrî berhev kiriye û weşandiye.

Z. Zinar romannivîser nîn e, lê wî du çîrokên gelêrî bi stîleke nû û nûjen, bi forma romanê nivîsiye û pêşkêşî xwendevanên kurd kiriye. Navê herdu çîrokên gelêrî ku bi qalibeke nû û bi şêweya romanê hatiye nivîsin ev in : 1 – Hemdîn û Şemdîn – 2 – Siyabend û Xecê. Herçiqas li ser berga pirtûka Siyabend û Xecê ”Destan” hatiye nivîsîn jî, pirtûk bi şêweya destanî na, bi şêweya pexşanî û bi stîla romanê hatiye nivîsîn û weke romanê hatiye afirandin. Herçiqas li ser berga pirtûkê destan hatiye nivîsîn jî bi min ev pirtûk roman e.

Dema navê Z. Zinar bê gotin, di cîde deh cild ”Xwençe” tê bîra mirov. Berhevkirin û amadekirina deh cild ”Xwençe” ji bo çand, edebiyat û zimanê kurdî dewlemendiyeke û herweha kilam –stran - , helbest, çîrok û çîrvanokên ku di Xwençe de bi cih bûne ji wundabûnê xilas bûne û ev bi xwe hêjayê pesnê ye.

Bi min heger Z. Zinar dîsa dest pê bike û weke Xwençe deh cildên din yên çîrokên gelêrî û hemû cure berhemên folklorîk yên di nav kurdan de bicivîne, berhev bike û ji bo weşanê amade bike, dê dîsa kar û xebateke hêja pêk bîne.

Z. Zinar nivîskarekî berhemkare û ew xebata xwe ya nivîsînê didomîne û hersal gelek pirtûkên kurdî dinivîse û diweşîne. Bi hêviya ku ew





romaneke din jî li pirtûkxaneya kurdî zêde bike û edebiyata kurdî dewlemend bike.

Apê kî min hebû. Ew qet neçûbû dibistana Tirka. Ez demaku/wexta kû piçûk bûm, wî ji min û ji zarokên xwe re destan‘a ”Mem û Zînê” û a ”Siyabend û Xecê” digotin. Min wan herdu destanên kurdî pir-hendik di heşê xwe da hiştibû. Piştî ku ez mezin bûm û min pirtûka bavê neteweparêziya kurd, westayê wêjeya kurdî, nemir Ahmedê Xanî “Mem û Zîn” ê xwend, min ev rastî dît ku tiştê ku apê min gotibû û ev pirtûk wekhev bû. Te digot qey apê min ew pirtûk xwendîiye û ji min re qal kiriye.

Di piçûkiya xwe de, min herî pirr ji çîrok û destana Mem û Zîn, Siyabend û Xecê, Kero û Kulik, Şahmaran û Hespê Bozê Rewan hestikirin. Ji wan pênç destanên xweş yên dîrokî sisê jê pirtûkên wan derketine, lê herdu yên din hêj pirtûkê wan derneketiye. Ger herdu yê din jî pirtûkê wan yên bi zimanê kurdî derkevin, dê edebiyata kurdî hîn jî zêde dewlemend bibe.

Pirtûka Siyabend û Xecê bi şêweya romanê hatiye nivîsîn û di nav weşanên Pencînar – Çanda Kurd de derketiye. Ji bo ku çîroka Siyabend û Xecê ji alî gelek kurdan ve tê zanîn, loma min behsa naveroka çîroka Siyabend û Xecê nekir.



# Binpêkariyên mafê mirov di Kurdistanê de

## Du girtiyên siyasî yên Kurd ji veguhastin bo nexweşxaneyên derveyî girtîgehê hatine bêparkirin

Du girtiyên siyasî yên Kurd û xelkê bajarê "şino" yên bi navên "Ezîz Qadirtac û Kemal Quytasî" li girtîgeha bajarê "Nexed"ê rastî êşa pişt û zendê hatine û ji veguhastin bo nexweşxaneyên derveyî girtîgehê hatine bêparkirin.

Pêka nûçeya ku gihîştiye bi Ajansa Nûçegihaniya "Kurdpa"yê, li girtîgeha "Nexed"ê du girtiyên Siyasî bi sedema pişit êşe û azara zendên xwe ji aliyê berpirsên girtîgeha "Nexed"ê ve ji veguhastin bo nexweşxaneyên derveyî girtîgehê hatine bêparkirin.

Herwisa wê çavkaniya agehdar daye zanîn: "Ezîz Qadirtac û Kemal Quytasî, di girtîgehê de li ser erdê dirazên û berpirsên girtîgehê textên razanê bo wan dabîn nakin."

Roja Sêşemî 24ê Cozerdanê, "Kemal Quytasî û Ezîz Qadirtac" du girtiyên siyasî yên Kurd û xelkê bajarê "şino"yê ji girtîgeha wî bajarî bo girtîgeha bajarê "Nexed"ê hatibûne veguhastin.

Roja şemî 7ê Cozerdanê, "Kemal Quytasî" piştî gazîkirin bo taya cîbicîkirina cezayan ya dadgeha şoreş li bajarê "şino" hate binçavkirin û bo cîbicîkirina cezayê xwe bo girtîgeha wî bajarî hatibû veguhastin.

Ew welatî bi tohmeta "endambûn û hevkarîkirin digel yek ji partiyên Kurdî" ji aliyê taya 1 a dadgeha Şoreş a bajarê şinoyê bi serokayetiya dadwer "Rizayî" bi sê sal girtîgeha te`izîrî hatibû cezadan û ew cezaye jî roja Yekşemî 7`ê Xakelêweyê bi navbirî re hatibû ragihandin.

Herwisa, roja Pêncşemî 5`ê Cozerdanê, "Ezîz Qadirtac" mamosteyê dibistana destpêkî ya gundê "Nerzîwê" yê bajarê şinoyê, piştî gazîkirin bo dadgeha şoreş a wî bajarî hate binçavkirin û bona cîbicîkirina cezayê xwe bo girtîgeha wî bajarî hate veguhastin.

Ew mamosteyê Kurd ji aliyê taya 1 a dadgeha şoreş a bajarê şinoyê bi serokayetiya dadwer "Rizayî" bi tohmeta "endambûn û hevkarîkirin digel yek ji partiyên Kurdî" bi sê sal girtîgeha te`izîrî hatibû cezadan û ew cezaye jî roja Yekşemî 7`ê Xakelêweyê bi navbirî re hatibû ragihandin.

## 9 çalakvanên sinfî yên mamosteyan bi danîna barimteyê ji girtîgeha bajarê Seqizê hatin azadkirin

Roja Şemî 28ê Cozerdanê, "Tahir Qadirzade, Mihemed Fetahî, Enver Fereczade, Selah Husênî, Husên Mihemedî, Keywan Mihemedî, Xalid Şêxî, Luqman Ellamuradî û Qadir Yesrabî" endamên Encûmena Sinfî ya Mamosteyên Kurdistan- Seqiz û Zîwiye, bi danîna barimteyê ji girtîgeha bajarê "Seqiz"ê hatine azadkirin.

Ew 9 çalakvanên sinfî bi danîna berimteyê heta dema dadgehîkirinê bi awayekî demkî ji girtîgeha bajarê "Seqiz"ê hatine azadkirin. Herwisa roja Pêncşemî 26ê Cozerdanê, "Awat Rezewî" çalakvanê sinfî û endamê Encûmena Sinf ya Mamosteyên Kurdistan-Seqiz û Zêwiye, bi wergirtina soznameyê li yek ji girtîgehên ewlehî yên bajarê "Seqiz"ê hat azadkirin.

Ew 10 çalakvanên sinfî yên mamosteyan di rojên Çarşemî û Pêncşemî 24 û 25ê Cozerdanê ji aliyê hêzên ewlehî ve hatibûne binçavkirin.

## Pênc çalakvanên warê kedkarî yên Kurd bi danîna barimteyê hatin azadkirin

Roja Şemî 28`ê Cozerdanê, "Perwîn Ebdullahpûr, Fuwad Faruqî, Se`îd Mihemedî, Umer Silêmanî û Fatih Mecîdî ji çalakvanên warê kedkarî yên xelkê bajarê Banê, bi danîna barimteyê ji girtîgehên bajarê Bane û Sineyê hatin azadkirin.

Ew pênc çalakvanên warê kedkarî her yek ji wan bi danîna barimteya 300 milyon Tumenî bi awayek demkî heta dema dadgehîkirinê ji girtîgehê hatin azadkirin.

Ew pênc çalakvanên warê kedkarî di heyama binçavkirinê de ji mafê "destpêregihîştin bi parêzer û hevdîtin digel malbatên xwe" hatibûne bêparkirin.

"Fatih Mecîdî", yek ji çalakvanê warê kedkarî yê ku hatibû binçavkirin ji roja Duşemî 19`ê Banemerê ve bi sedema nerizayetî li derheq binçavkirina neyasayî û destnegihîştin bi dermanên xwe dest avêtibû gireva birçîbûnê.

Di wê heyamê de, "Fatih Mecîdî" bi dest û pêyên girêdayî bo derveyê girtîgeha îdareya Îtila`ata bajarê Banê hatibû veguhastin û piştre ji nexweşxaneya Selahedîn Eyûbî ve bo girtîgeha hatibû zivirîn.

Roja Sêşemî 6`ê Banemerê, ew pênc çalakvanên warê kedkarî bi bê hebûna ti belgeyên yasayî ji aliyê hêzên ewlehî ve hatibûne binçavkirin û bo lêpirsînê bo girtîgeha ewlehî li bajarê Banê û Sineyê hatibûne veguhastin.

Heta niha ji sedema binçavkirin û tohmetên ku li dijî wan pênc çalakvanên warê kedkarî hatinî sepandin ti zanyariyek serast ber dest nîne.

# Agirî

◆ Rojnameya "Agirî" di van malperên jêrên de bixwînin:
◆ www.Kurdistanmedia.com
◆ www.Agirimedia.org
◆ rojnamaagiri@gmail.com
◆ www.facebook.com/Agirikirmanji

Navnîşana derveyî welat: AFKB.P. 102- 75623 ParisCEDEX 13 –FRANCE E - Mail: Agiri2003@gmail.com Hejmar (424)

## Wêneyên rêzgirtin ji têkoşîna 20 sale ya jinên endam li YJDKÎ



